Gotina Hevbenda demoqrat a Kurd li Sûriyê û Eniya demoqrat a Kurd Li Sûriyê

Xwîşk û birano ……

Îro em di hembêza Efrîna buha , li gundê Maratê yê xebatkar dighên hev ,ta ku em bi rêz û hurmet û bejintewandî li pêş koçberkirina mûmeke ji mûmên Efrîna sermedî bisekinin , û xatirê xwe ji mirovekî ji xelkê çiyayê kurmênc ve naskirî , nimûnak ji welatperweriya durist , û simbolek ji simbolên xebata niştimanî ya Kurd li Sûriyê bixwazin . Ew jî xebatkarê koçberkirî , mamoste Edîb Ibrahîm e . Wendayê me yê buha , perwerdeyê nifşan , xwedî sinciyê baş û bilind , evîndarê gelê xwe , û bi welatê xwe Sûriyê re dilsoz bû . Nemirê me di destpêka xortaniya xwe de , derbasî nav refên Tevgera niştimanî ya Kurd bû , ji ber baweriya wî bi dadmendiya doza gelê xwe yê Kurd li Sûriyê . Ew endamekî bi nav bû di rêbertiya Tevgera Kurd e , û nimûnak ji fedekariyê re , bi hertiştê buha , di ber doza gelê xwe de bû . Wî koçberî , di dema xebata xwe li welêt de , hemî rengên zorên derûnî û arziyê didîtin , ta ku sersedema ku , welat û gelê xwe berde û li welatê biyaniyê (Almaniya) bibe koçberekî siyasî , û li wir jî di ber doza gelê xwe de , ta mirinê berxwedanê bike .

Bi navê Eniya Demoqrat a Kurd û Hevbenda Kurd li Sûriyê , em xwe , gelê xwe yê Kurd , xwediyên wendaker , hogir , û hevalên partiya wî (Partiya Yekîti Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê) sersax dikin û aramiyê ji wan re hêvî dikin .

Û em ji xwedê lava û hêviyandikin da ku , di buhuştên xwe de bi cî bike . Û sipas .

****

Dumahîk : Xebatkar Edîb

kurdayetiyê; bi xwedîderketina li vîn,armanc û daxwazên gel û girtina wan di ser hertiştekî din re. Em soz didin hevalê xwe ku dê partiya wî her li ser wê riya kurdayetiyê bimîne, riya girtina berjewendiyên gelê kurd di ser her tiştekî din re

. Em, weke Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê sersaxiyê ji malbata wî, hevalên wî, tevgera kurd û tevaya gelê kurd re hêvî dikin û dibêjin: Bila ciyê wî her Buhuşt be. Serkeftin jî helbet dûr an nêzîk ya doza gelê me ya netewî, demokrat, rewa û dadmend e.

Bijî azadî, demokratî û wekhevî

Duşem, 20.05.2007

Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa ya

Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê